Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî De

Hejmar: 159
21'ê Gulana 2011
Buha: 150 Tûmen

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi

## PDK Îranê nameyek servekirî ji hevalên cudabûyî ji xwe re şand

R:2


**Dadgeha Federal a Amerîkayê:**
## Rejîma Îranê mezintirîn piştewanê encamderên bûyera 11'ê Septamberê ye

R: 6

## Karnameya reş a Komara Îslamî a Îranê li rapora nû ya Efûya Navnetewî de

R: 7

## "Ewropiyek li welatê kurdan"



**Pirtûka Nesrîn Qasimlo(Hêlîn),** hevjîna Dr. Qasimlo R: 11

# Mistefa Hicrî: Demokrasiya li deverê bi qazanca civaka cîhanî ye



Li doma sefera dîplomatîk a Sekreterê Giştî ê PDK Îranê ji bo Amerîkayê de, birêz Mistefa Hicrî serbarê dîdar û hevdîtinên bi nawendên siyasî û mafên mirovî û kesatiyan re, beşdarî li gelek kor û civînan û got û bêjên televîzyonî û ragihandinî de jî kir û rewşa siyasî a Îran û netewên bindeste Îranê nirxand û siyaset û helwesta partiyê jî li vê derheqê de zelal kir.

Dîdar li gel Komîteya Derveya Senaya Amerîka, Nawenda berevanîkirin ji demokrasiyê, jêrkomîteya Rojhilata Navîn li Kongirêsê, rêxistina penaberî a Hayas, rêxistina çavdêriya mafê mirov ê kurd û hevdîtina bi çendîn kesatî û endamên civata nûnerên Amerîkayê beşek ji wan dîdaran in.

Birêz Hicrî li rûniştinên xwe de bi taybet li Senaya Amerîkayê de rewşa dever, Îran û Kurdistanê nirxand û işare bi aloziyên deverê kir û da zanîn: Her guhertinek ku welatên deverê ber bi demokrasiyê ve bibe, bi qazanca welatan, dever û civaka cîhanî ye û dîktator û bi tayber rejîma Îranê têde zirarê dibîne.

Zaniyariyên zêdetir li ser wan dîdaran li malpera "kurdistanmedia"de



**Hunermend Bêwar Îzet:**
**Ji ber wê ku di dema ji dayîkbûna min de, bavê min penaber û bê war bûye, navê min kirine Bêwar** R: 10

## Amerîkayê tehrîm xiste ser Beşar Esed û fermandeyên Sipaha Pasdaran

Amerîkayê seba tepeseriya serhildêran di Sûriyê de, tehrîm xiste ser Beşar Esed, serkomarê Sûriyê û şeş berpirsyarên payebilin ên wî welatî û herweha du fermanderên Sipaha Pasdaran...R: 2






## Înterpol yekîneya xebat li dijî terorîzma navikî pêk tîne

Saziya Polîsê Cîhanî biryar daye ku yekîneyekê taybet bo xebata li dijî terorîzma navikî û diziya madeyên navikî pêk bîne.

Yek ji erkên din yên vê saziyê pêşîgirtin ji birêvebirina emeliyatên terorîstî bo ser yekîneyên etomî ye.

## Pêngavek pîroz

**Ebdula Hicab**

Avakirina Eniya Ked, Demokrasî û Azadî li Bakûrê Kurdistan û Turkiyê, pêgavek girînge siyasî bû ku tê hêvîkirin bi awayek erênî ... R:3



## Xak, ziman û ala; xeta sor!

**Şehab Xalidî**

Yek ji hilbijartinên herî giring û çarenûssaz di Turkiyê de hilbijartinên parlemanî ne, lê vê hilbijartinê ji bo Kurdan ... R: 6



## Cinayetên rejîma Sûriyê û helwesta lawaz a cîhanî

**Selîm Zencîrî**

Piştî borîna du mehan bi ser nifûza "bihara Erebî" û pêlên demokrasîxwaziya deverê ... R: 7



## Mezintirîn pirsgirêka jiyanê di dema îro de

**Sefiye Xalidî**

jiyana îro ku bi alîkariya zanist û teknolojiyê, roj bi roj pêş dikeve û li pey xwe derfet û îmkanên... R: 8

www.erivankurdi.org

# Nameyek servekirî bo wan hevalên ku piştî Kongireya 13'ê ya PDK Îranê ji vê partiyê cuda bûn

Cudabûna we ji refên partiyê, bûyerek nexweş bû bo me, û tevgera Kurd li Kurdistana Îranê hevrîşî xesarek mezin kir. Her di roja piştî vê bûyerê de me bi merema kêmkirina wan zirar û xesaran daxwaz kir ku bi diyarîkirina navek nû ji xwe re, riya diyalog û ji vê yekê jî pêtir, riya harîkarî tevî PDK Îranê vekirî bihêlin, lê mixabin daxwaza han piştî derbasbûna salan, bê bersiv ma.

Di rewş û zirûfa îro de ku çavnihêriyên zaf ji guhertinên siyasî di herêma Rojhilata Navîn û nemaze Îranê tê kirin. Di vê derheqê de hûn jî di bereberê xweberhevkirina kongireya xwe de ne, me bi hewce zanî ku car din vê daxwaza xwe bînin holê û daxwz ji ve bikin ku cehdek berpirsane ji bo vê armancê bikin.Bê guman karek han dibe cihê keyfxweşiya netewa me û dê harîkar be bo destpêka jinavbirina zaf asteng û girêpêçkên ser riya pêkanîna harîkarîkirin û ji hev nizîkbûna parek zaf ji hêzên opozîsyona Kurdî li Îranê. Em bi vê hêvî û çavnihêrê avêtina wê gava ve dibin.

**PDK Îranê**
**Deftera Siyasî**
**17. 05. 2011'an**

## Sergotar

# Şerê navbera mohreyan, bo berjewendiya xelkê yan talan û desthilata zêdetir?

**Selîm Zencîrî**

Komara hov û îdeolojîkî a Îslamî a Îranê her li dema hatine ser kar a xwe de rê û rêbazek hişk girte pêşberî xwe ku yên li derveyî sînor û çarçoveya hizrî a wê de, dikewin çepera hember. Vêca li her pile, berpirsatî û xwedî pêşîneyek xebat û xizmetê de bin, dikevin ber xezeba şûra Wîlayeta Feqîh.

Eva ku midehek e bi navê şer û kêşeyên nava bandên desthilatê de xwe nîşan dide û bûye bi rojev û parek berbiçav ji medya û ragihandinên giştî ên cîhanê û opozîsyona Îranê jî bi xwe ve mijûl kiriye, ne tiştek nû û ne jî ewqas girîng û gavek bihêvî ne bi qazanca xelkê.

Bûna şer û kêşeyan li nav moreyan de rastiyek dilxweşker e, û dibe azadîxwazên Îranê û civaka cîhanî bi nisbet şere gura moheryan rola temaşevanan bilîzin û li rastî de dîmenê şere gur û keftaran li daristanê de li ser kelexan bînin bîra xwe ku çavan bi kelb û didanên bixwîn yên xwe bona jêkirina tîke goştek zêdetir digirnijine hev. Lewma bi qasê ku ew şer li yasaya daristanê de siroştî ye, bi heman rade jî li sîstema komara Îslamî de siroştî ye; çunku eva 33 sal in ku karbidestên rejîmê li ser hesaba talan û dizîna mal û samana xelkê Îranê çavsoriyê ji hev dikin û weke band û girûp li wêdedana hev de ji tu tiştekê xemsarî nekirine, lê li hêla sor a nîzamê baz nedane û li demên hesas de yekgirtî û qahîmtir ji caran meşiyane; lewma êdî eyan e ku ew şeretimikanêya ne li ser berjewendî û mafên xelkê, belkî li ser desthilata zêdetir û para dizîna zêdetir e.

Lê ya li vir de girîng, ew e ku nabe xelkê Îranê û bi taybet opozîsyon bikeve dav û telikê û dilê xwe bi guhertina li nav rejîmê û mohreyên wê de xweş bike û ji hêla sereke a xebat û bicihkirina sîstemek demokratîk bi dûr bikewin. Jiber ku guherîna mohreyan li vê sîstema totalîter de tiştek formalîte û sembolîk e û tu xizmetê bi pêşveçûn û dadperweriya civakê bi qazanca xelkê nake. Her wek li dema maşkanêya gera 10'mîn a hilbijartina serkomariya Îranê de çawan hin kes, alî û partî bi gotinên birîsqok yên mohreyên rejîmê hatin xapandin û bi beşdariya xwe, xwast û armanca rejîmê di kişandina xelkê bo ser sindoqan de bicih anîn û niha, tepan ji çokên xwe dixin ku em hatin lêbandin. Lê helwesta bicî a PDKÎ wê demê(baykut), siyaseta rast, durust û nasîna zêdetir a ji rejîmê li nav opozîsyonê de selimand.

Li vê qonaxa hesas a deverê û bi baldan bi rewşa xirab û aloz ya rejîma Îranê li navxwe û derve de, zirûf ji opozîsyonê dixwaze ku bi tekez li ser xwast û helwestên demokratîk, hevgavî û xebatek tevalî li astên cur bi cur bi dijî rejîmê bo cihgîrkirina demokrasiyê di çarçoveya Îranek demokratîk û federalî de bimeşînin.

## Heyetek Perlemantoya Almaniya serdana binkeya pêwendiyên PDK Îranê li Hewlêrê kir




Roja Yekşemî, 15'ê Gulanê, heyetek Perlemana Almaniya Federal pêkhatî ji "Ota Tsapf", endama Perlemana Almaniya û berevankara mafê Kurd, "Volvang Tîfînzî" endamê perlemana Almaniya û Wezîrê berê yê Almaniya û endamê niha yê Komîteya Abûrî a Almaniya, "Martînî Vays" şêvirmendê dîplomasî û hejmarek ji berpirsên Almaniya, seredana binkeya pêwendiyên PDKÎ li Hewlêrê kirin û ji aliyê heyetekê ve bi serperestiya Hesen Şerefî, cihgirê sekreterê giştî yê Partiyê ve, bi germî hatin pêşwazîkirin. Di vê hevdîtinê de Hesen Şerefî basek li ser fitneyên rejîma Tehranê di deverê de û xwe rêknexistin tevî pêwerên navnetewî û tepeserî û îdama keç û xortên netewên bindest ên Îranê û di nava wan de jî qîz û xortên Kurd û dijayetiya bêdawî a Komara Îslamî derheq bi PDKÎ kir.

Heyeta mêvan jî rola PDKÎ bilind nirxand û bas ji dîroka dostayetiya PDKÎ û Partiya Sosyal Demokrat a Almaniya û pêwendiyên dostane li gel rêberên şehîd ên partiyê " Dr. Qasimlo û Dr. Seîd" kirin û çendîn pirs li ser meselên cur bi cur ên rojevê ji birêz Hesen Şerefî kirin, ku bi hûrî hatin bersivdan.

## Sê rêkxirawên Ewropî serdana Deftera Siyasî a PDKÎ kirin




Roja Sêşemî, 17'ê Gulanê heyetek biyanî ku pêk hatibûn ji sê rêkxirawên siyasî ên Ewrûpayî û nûnerê Îdareya Penaberiya Swîsê, serdana Deftera Siyasî ya PDKÎ kirin û ji aliyê heyetek Deftera Siyasî ve bi serperestiya rêzdar Hesen Şerefî, cîgirê sekreterê giştî ê PDKÎ ve hatin pêşwazî kirin.

Di vê civînê de heyeta mêvan li ser rewş û jiyana penaberên Îranî ên akinciyên Kurdistana Îraqê û endam û alîgirên PDKÎ li Îraqê û li Îranê û li dervey welat pirsyar kirin û ji aliyê heyeta PDKÎ ve bi hûrî bersiva pirsên wan hate dayîn.

Herweha komek bas û pirsên siyasî derbarê erk û rolê PDKÎ de ketin ber basê, ku di vî warî de jî heyeta PDKÎ bi awayek rohn û zelal îşare bi aliyên cur bi cur ên wan pirsan kir.

## Amerîkayê tehrîm xiste ser Beşar Esed û fermandeyên Sipaha Pasdaran

**Amerîkayê seba tepeseriya serhildêran di Sûriyê de, gemaro xiste ser Beşar Esedê serkomarê Sûriyê û herweha şeş berpirsyarên paye bilin ên vî welatî**

Li gorî vê nûçeyê di nava wan berpirsyarên Sûriyê de navê Elî Memluk serokê saziya Îtilaata Sûriyê, Atif Necîb kurxalê Beşar Esed û serokê pêşîn yê Îdareya Ewlekariya Siyasî, û Mahir Esed birayê Beşar Esed tê dîtin.

Herweha hate ragehandin ku Qasim Solêymanî fermandê hêza Quds a Sipaha Pasdaran û Mohsin Şîrazî yek ji alîkarên navbirî seba desthebûna li tepeseriya xûnîn ya serhildêran di Sûriyê de ketin ber tehrîmên Amrîkayê.

Wezareta Xizînedariya Amrîkayê jî ragehand ku wê dest bi ser tawaya darayî û hisabên beşar Esed û şeş kes ji berpirsyarên hikûmeta Sûriyê de bigre. Herweha şîrketên Amrîkayî jî êdî nikarin bi wan kesan re bikevne nav têkilyan de.

Tepeseriya neraziyan di Sûriyê de hêla jî berdewam e û rejîma Sûriyê dixwaze bi riya wan tepeseriyan xelê bi yekcarî bêdeng bike û dirêjiyê bide deshilata xwe.

Ew tepeserî gihîştiye astekê ku li bajarê Dera li başûra Sûriyê de gorekî bi kom hat dîtin ku kesên kuştî li bi awayekî nihênî di wir de weşartibûn.

# Pêngavek pîroz



**Ebdulla Hicab**



Avakirina Eniya Ked, Demokrasî û Azadî li Bakûrê Kurdistan û Turkiyê, pêgavek girînge siyasî bû ku tê hêvîkirin bi awayek erênî karîgeriyê li ser encamên hilbijartina 12ê Hezîrana 2011'an li Turkiyê danê. Bi vê pêgavê re Kurd bi yekdengî tevli pêvajoyek girîng dibin û bi hev re dikevin rikeberiya bi reqîbê xwe yê serekeye siyasî li Kurdistanê, anku Partiyê Dad û Vegeşîn (AKP)ê re. AKP bi wesîleya bikaranîna hestên oliye civakê, di her du hilbijartinên beriya niha de li salên 2002 û 2007'an li Bakûrê Kurdistanê dengê herî zêde anîbûn. Tê payîn hevbendiya ku îsal di navbera partiyên siyasiye Kurd de çêbûye, karîgeriyê li ser wê rewşê danê û tayê terazûyê bi aliyê hevbendiya hêzên Kurd ve hinekê giran bike.

Di nava 27 partiyên siyasî ku li gor Konseya Bilind ya Hilbijartina Turkiyê wê di hilbijartina meha 6 de beşdar bin, tê pêşbînîkirin ku tenê 2 an 3 partî benda 10% a hilbijartinan derbas bikin û bikevin parlemanê. Hin partî û aliyên din wê bi riya berendamên serbixwe bikevin hilbijartinê û tenê piştî bi dawîhatina hilbijartinan wê bikarin dubare bikevin çarçoveya partiyan û weke firaksyonên siyasî kar bikin. Partiya Dad û Vegeşandin (AKP) di bin serokatiya serokwezîr Recep Tayip Erdogan de, Partiya Komariye Gel (CHP) bi serokatiya Kemal Kiliçdaroglu û partiya Tevgera Neteweiye Turk (MHP) li bin rêberiay Dewelt Bahçeli navên herî zêde li ser zar û zimanan in ku tê pêşbînî kirin di hilbijartina pêşerojê de li pêş bin, lê serketina MHPê hê di şik û neşikê de ye.

Li Kuridstanê Eniya Ked, Demokrasî û Azadî ya pêkhatî ji Partiya Aştî û Demokrasî (BDP), Partiya Maf û Azadî (HAKPAR), Partiya Demokrasiya Beşdar (KADEP) alternatîva hevpare gelê Kurd ji bo hilbijartina pêşerojê ye. Mesaja sereke di programa hilbijartinê ya wê hevbendiyê di têkoşîna hevpar ji bo çareserkirina pirsa Kurd li Bakûrê Kurdistanê ye. Tê pêşbînî kirin ku hevbendiya Kurdî di asta Turkiyê de li rêza 4'ê de be, lê benda hilbijartinê derbas neke. Li Kurditsanê wê platforma nûavaye Kurd bi (AKP)ê re li ser gelek kursiyên Parlemanê di pêşbirkêya cidî de be. Armanca (BDP) û hevbendiya Kurd eve ku sinorê destkevtên hilbijartina sala 2007'an derbas bike. Di hilbijartina wê demê de parlemanterên ku nûneriya Kurdan dikirin û niha di çarçoveya (BDP)ê de kar dikin 20 kes bûn. Di heman demê de (AKP) îdia dikir ku 75 nûnerên ji esla xwe Kurd derbasî parlemana Turkiyê ya ku ji 550 nûneran pêk tê kirine. Eger hilbijartina îsal wê parsengê bi qazanca hêzên di eniya Kurd de biguhere, wê çareseriya pirsa Kurd bi riyên qanûnî û siyasî bi awayek cidî bikeve rojevê.

Hilbijartina sala 2011'an ji çareseriya pirsa Kurd li Bakûrê Kurdistanê bi der, ji bo pêşeroja siyasiye Turkiyê bi giştî jî pir giring e. Ji niha ve xuya ye ku serketina AKP misoger e, lê pirsa serke eve ka gelo ka partiyên din wê bi çi qursaiyekê bikevin Parlemanê û bi çi awayî karîgeriyê li ser reformên pêşerojê li siyaseta Turkiyê dabinên. AKP ku di wan 8 salên dawî de karîbû abûriya Turkiyê ji bêîstiqrarî û tevliheviyê re derbasî abûriyek xurte xwedî îstiqrar bike soz daye ku Qanûna Bingehîn a Turkiyê biguhere û rewşa abûriyê hê baştir bike.

Li gor AKP pirsa Kurd jî çareseriya abûrî heye û wê bi riya reformên abûrî bê çareser kirin. Lê xeyalên Erdogan bi tenê ji Qanûnek bingehîn ya nû û xurt kirina bingeha abûriye Turkiyê re nasekinin. Yek ji armancên serekeye Erdogan ji reformên pêşerojê, li gor Henri J. Barkey, profesorê Amerîkayî li ser pirsên Turkiyê, ev e ku sîstema siyasiye Turkiyê ji sîstema parlementarî re biguhere û ber bi sîstemekê ve bibe ku di wê de serok komar xwediyê rola sereke ya birêveberiya welat be. Erdogan ji niha ve xwe ji bo serokkomariya pêşerojê daniye û ji bo wî tenê rolek teşrîfatî têr nake. Lewma Erdogan û hevbîrên wî di nava AKP'ê de hewl dan wan berendaman pitir bidin pêş ku wê hizra wî diparêzin û soz dane ku ji bo reformên di wê çarçoveyê de kar bikin.

Li ser riya Erdogan û AKP'ê sê pirsgirêkên sereke hene ku encamên hilbijartina îsal wê ji bo her yek ji wan pirsgirêkan bi awayekê karîger bin; Pirsa Kurd, nebaweriya di navbera civak û dewletê de û hêz û îqtidara artêşê. Sîstema siyasiye Turkiyê û Qanûna wê ya bingehîn ku piştî kûditaya leşkeriya sala 1980, di sala 1982 de hatibû amade kirin, nasyonalîzma Turkî bi bingeh digre û hemû hebûn û nasnameyên din înkar dike. Lewma di wê çarçoveyê de tu cî ji gelê Kurd û pirsa Kurd re nînin. Erdogan ji alîgirên xwe yên Kurd re soz daye ku bi guherîna wê Qanûnê wê ji xwe riya çareseriya pirsa ku ew jê re dibêje "mijara Başûr- rojahilata Turkiyê" û hin ji hevbîrên wî navê pirsa Kurd lê dikin çareser bike. Ev her wisan ji xwe bawere ku wê bi reformên xwe û bi xurt kirina bingeha abûriye civakê baweriyê di navbera dewlet û civakê de çê bike. Û serencam wê bikaribe hêz û deselata artêşê ji siyasetê dûr bixe û wê derbasî serbazgehan bike.

Lê ji bo sererast kirina destûrî û encamdana reforman Erdogan pêwîstî bi dengên zêdetir ji dengên partiya xwe di parlemana siberojê de heye. Di wê rewşê de ye ku rola partiyên din û bi taybet eniyek xurte Kurd di parlemana Turkiyê dikeve rojevê. Partiyên guhertinxwaz di parlemana siberojê de, ji AKPê bi der, CHP û Eniya Kurd in. Ji ber ku MHP bi hemû awayî li dijî her şêweyên reformane û nayê pêşbînî kirin ku alîkariyê bide pêvajoya guhertinan, rola CHP û hêzên Kurd hê giringtir dibe. CHP guhertinan dixwaze, lê li ser pirsa Kurd hê nevêre bi eşkere gavan bavêje. Lewma AKP wê neçar bimîne ku di parlemana siberojê de hem li ser hêzên Kurd û hem jî li ser CHP hesab bike. Bi taybet rola parlamenterên Kurd wê gelek giring be.

Hevbendiya ku li navbera hêzên Kurd pêk hatî, ji encamên hilbijartinê û karîgeriya wê li ser reformên pêşerojê bi der ji qedera siyasiye Kurdan re jî xwedî bandorek girînge. Eniya Ked, Demokrasî û Azadî bi wê hevbendiyê nîşan da ku Gelê Kurd şiyana hindê heye ku sînûrê pirsên siyasî û îdeolojîk derbas bike û bikeve çarçoveyek neteweyî. Her sê hêzên ku wê hevbendiyê pêk tînin her çend li barê hêz, nêzîkbûna siyasî û heta şêweyên têkoşînê ji hev cuda bin, lê bi hev re nûneratiya hêvî û daxwaziyên siyasiye gelê Kurd li Bakûrê Kurdistanê dikin. Bi wê pilatformê, wan hêzan nîşan dan ku hêz bi tenê di hevgirtinê de ye û bi platformên weha hemû bi hev re mezin dibin û gel hêviyê peyda dike.

Platforma Ked, Demokrasî û Azadî pêgavek din ya girîng û werçerxînek siyasî bû ku gelê Kurd di riya çareseriyê de hildigre. Eger ev platform bikare hejmara parlemanterên Kurd bike du hindeyî yên niha, wê rengê Parlemana Turkiyê bi awayek erênî û li ser qazanca çareseriyek aştiyane bê guherîn. Ew erka girîng li pêşiya nûnerên Kurd pêwîstiya parastin û xurtkirina platforma nûava zêde dike. Pêgava tê ku ji bo pêşeroja gelê Kurd li Bakûrê Kurdistanê girînge wê ew be ku hêzên siyasiye ku li derveyî qanûna Turkiyê ne û nûneriya têkoşîna netewî ye Kurd dikin, li dora platformek hevbeşe neteweyî kom bibin. Pêgava ku di navxweyî welat de hat rakirin, bê guman bi piştgiriya tevgera neteweyî bi hemû hêz û pêkhateyên xwe ve bû. Lewma hem hêvî û hem hêza pêwîst ji bo pêkanîna platformek neteweyî ya berfireh heye û tenê hinek zêdetir ked û hinek pitir îrade dixwaze heya hêzên Kurd yên ku pêşengiya têkoşîna rizgariya neteweyî li Bakûrê Kurdistanê dikin bikevin eniyek hevbeşe neteweyî.

## Geylanî: Erdoxan berpirsê rijandina xwînê ye!

**Sekretêrê Giştî yê BDP'ê Hemît Geylanî li navenda giştî a BDP'ê di civîneke çapemaniyê de, li ser bûyerên ku rû didin axivî û peyamek vekirî da Erdoxan.**

Geylanî got: "Her canê dikeve ser xaka vî welatî, parçek ji canê me ye.

Di parçekirina van cana de, hikûmet û serkêşê wê ku riya Hîtlerê faşîst girtiye û li ser cana siyasetê dike, berpirsiyar e. Lewma, berpirsê rijandina her dilopek xwînê, hikûmet û serkêşê wê Erdoxan e. Destê xwe ji beden û pêsîra gelê Kurd vekişîne. Destê xwe neke nava konên çareseriya demokratîk û xutbeyên înan. Nexwe, wê tiştek ji wî destî were!.."

**Avestakurd**

# Kurdistan her niha jî çepera azadîxwaziyê ye

Rûken

Roja 19'ê Banemerê (9'ê Gulanê), mamosta Ferzad kemanger di gel çar girtiyên din ên siyasî bi navên Şîrîn Elem Hulî,Ferhad Wekîlî,Elî Hêyderyan û Mêhdî Îslamiyan di girtîgeha Êvînê de, piştî dadgehîkirinek ne dadperwerane û bêy evê ku parêzerê wan bikare bi awayekî azadane bergiriyê ji wan biket, bi dûr ji berçavgirtina eslên yasayî û di çarçoveya sînaryoyek ji pêşda darêtî û dijî Kurd, û dûr ji prensîpên mirovatiyê hatin bidarvekirin.

Xelîl Behramiyan parêzerê Ferzad Kemanger, Şîrîn Elem Hulî, û Mêhdî Îslamiyan her piştî birêveçûna hukmê bidarvekirina wan kesan bi bê agehdakirina parêzer û malbata wî bi bîr û raya giştî ragehand:

“Ew îdamên ku îro birêveçûn, karesatek mezin bû ku me çavnihêrî nedikir. Ne ez û ne jî malbatên bidarvekiriyan em agehdarî birêveçûna hukmê bidarvekirina Ferza Kemanger nebûn. Ez demjimêr 10'ê sibê ji riya têkiliyek telefonî ya nûçegehanekî ve ji birêveçûna hukmê îdama Ferzad agehdar bûm”.

Herweha Mêhrdad Kemanger birayê mamosta Ferzad jî derbarê rêveçûna hukmê bidarvekirina birayê xwe got: “Ne berpirsyarên girtîgehê û ne jî berpirsyarên dadweriyê, malbata me ji rêveçûna hukmê bidarvekirina Kemanger aghdar nekiribû”.

Piştî bilavbûna nûçeya bidarvekirina mamosta Ferzad Kemanger û hevalên wî, Kurdên navxwe û derve ên welat bi derkirina daxûyaniyan û rêvebirina meşên curbicur û hilgirtina pilakardan, digel malbatên wan û bi taybetî di gel Xatû Seltene diya mamosta Ferzad Kemanger hewderdî kirin, û ew kiryar bi tundî şermezar kirin.

Mamosta Ferzad Kemanger ew mamostayê Kurd bû ku bi nivîsandina nameyan di nav girtîgehê de, û şandina wan nameyan bo dervey girtîgehê ku naweroka her yek ji wan nameyan bixwe derseke evîna ji bo xak û nîştiman têde bû, niyetpakî û bê tawanbûna xwe ji dîrokê û her mirovekî xwedî vijdan re eşkere kir.

Ew mamostayê ku di yek ji nameyên xwe de nivîsandibû: “Rojekê ez wek “Miharib” binav kirim, ew ser vê baweriyê bûn ku min di gel “Xuda”yê wan şer kiriye, lewra kindirê dadperweriya xwe ristin da ku şefeqekê dawiyê bi jiyana min bînin. Ji vê rojê pêde ez çavnihêrê rêveçûna vî hukmî me. Lê evro ku biryare jiyanê ji min bistînin, min seba “hezkirina ji mirovan” biryar daye ku endamên laşê xwe pêşkêşî wan nexweşan bikim ku mergê min dikare jiyanê bide wan.

Herweha dixwazim ku dilê xwe bi vê hemû “Evîn û dilovaniya” ku têde ye bidme zarokekê. Îca ne girîng e ku ew zarok li ku be, li qeraxa Karunê yan jî li berbiniya Sebelanê, yan derdora Kewîra Rojhelat, yan zarokek be ku ji aliyê Zagrosê ve çavnihêrê derketina rojê be.

Tenê dilê serhilgirtî û bê qerar ê min, di singê zarokekê de lêde ku ji min yaxî û serhilgirtîtir, hêvî û xwaziyên dema zarokatiya xwe di şevê de bi heyv û sitêrkan re bas bike û wan bike şahid, bona vê ku dema ew zarok mezin bû, bixwe îxanetê bi xeyalên xwe ên dema zarokatiyê re neke”.

Di rastî de eger di serdemê deshilata reş ya kilîsayan wate li sedsalên navîn de kesek bi tometa selmandina zivirîna erdê li dewra rojê, wek dijî xwedê û klîsayê dihate naskirin, eva di sedsala bîst û yekê de ku çûna bo ser heyvê jî, ne tiştekî ecêb û cihê heyrîmanê ye, yên ku bi navê dînê Xwedê û wek nûnerê Xwedê li ser erdê bi ser xelkê de deshilatdariyê dikin, mamostayek bidar vekirin ku evîna wî ji bo xak û nîştimana wî, weha lê kiribû ku bi mergê xwe jî dixwast jiyanê bide mirov.

Herweha rejîma paşverû a Îranê bi bidarvekirina jina şoreşvan a Kurd Şîrîn Elem Hulî ( ku bi vê berxwedaniya ku di girtîgehê de kir, bê guman ew jî wek Leyla Qasim ew jina Şoreşvan ku di îşkencegehên rejîma Be's de bibû sembola berxwedaniya li hemberî sitemkaran de, ew jî dibe berxwedanvanek din a dîroka Kurd û Kurdistana dagîrkirî) selimand ku bi wan hemî îşkenceyên li gorî sedsala navîn ku li ser vê jinê rêvr biriye, dîsan jî nekariye morala polayîn ya navbirî têk bişkêne û wê neçar bike ku desta ji bîrûbaweriyên xwe hilgire, lewra li hemberî berxwedaniya wê de bêçare man û biryara bidarvekirina navbirî birêve birin.

.

Şirîn berî vê ku bê îdamkirin di nameyeke xwe de nivîsandibû: “Dema ku we lêpirsîn li min dikir, min heta nedikarî ku bi zimanê we biaxivim jî, û ez axavtina bi zimanê Farsî ji hevalên xwe hîn bûm, lê we bi zimanê xwe lêpirsîn ji min kir, û we ez dadgehî kirim, û we hukim ji min re birî. Eva jî di demekê de bû ku min nedikarî berevaniyê ji xwe bikim, ew îşkenceyên ku we li ser min birêve birine, bûne kabûsa şevên min, û êş û derdên li laşê min de bi min re rojên xwe derbas dikin û ... . Ez dizanim ku we tenê ez îşkence nekirime, belkû we ew îşkence li ser tewaya xortên Kurd û bi taybetî kesên wek Zêyneb Celaliyan û Runak Sefar zade û ... jî birêve biriye. Çavê dayikên Kurdan her rojê li benda dîtin yan jî bihîstina nûçeya îdama xortên wan pirr dibe ji rondik û berdewam nîgeran in ku çi rû bide, bi zenga her telefonekê tirs û wehşet dikeve nav dilê wan de.

Îro 02.05.2010'an e, û dîsan piştî heyamek zaf ez bo lêpirsînê birim bo benda 209 ya girtîgeha Êvînê, û dîsan tometên berê yên li ser min ducarî kirin, ji min xwastin ku bi hevkariya wan bikim, da ku hukmê îdama min were şikestin, gotin em her çi dibêjin divêt tu jî ducarî bikî, lê min ew yek jî nekir. Yên ku lêpirsîn ji min dikirin gotin ku me sala borî xwast ku te azad bikin, lê malbata te alîriya me nekirin, lewra tu tenê wek rehînekê di destê me de yî, heta ku em negîjin armancên xwe, emê te ragirin, yan jî emê hukmê îdama te birêve bibin, lê tu qet azad nabî”.






Xelkê Kurdistanê jî roja 23'ê Banemerê (13'ê Gulanê), bona eşkerekirina nerizayetiya xwe li hemberî vê cinayetê de, girevek giştî rêve birin û ew gireva giştî bi şêweyekê ji aliyê gelên din ên Îranê ve hate pêşwazîkirin, ku gelek ji kesayetiyên medenî û siyasî ên Îranê li ser vê bawerê bûn, ku heke ew jî bikarin bi vî awayî girevek giştî rêve bibin, ew ji wan re serkevtinek pirr girîng û mezin tê hesêbandin, ku dikare rejîma cehl û li gorî sedsala navîn ya Îranê, di tepeseriya azadîxwazan de bêçare bike.

Ji aliyek din ve ew gireva giştî demekê birêve çûye ku piştî tepeseriya tund ya meşên piştî hilbijartinê li Îranê, heyamek bû ku meşek bi vî awayî berçav birêve neçûbû û rejîmê dixwast bi bidarvekirina Ferzad û hevalên wî ku sembola berxwedaniya neteweya xwe ya bindest in, rewşek tewaw emniyetî û pirr ji tirs û wehşetê bi ser Kurdistanê de bisepîne. Lê xelkê Kurdistanê bi rêvebirina vê gireva giştî karîn rûpelek din ya zêrîn bi rûpelên din ên zêrîne xebatê ve zêde bikin û bi dost û dijminan biselmînin ku xebat li Kurdistanê heya rûxandina rejîma tepeserkar ya Îranê bi dawî nahê.

Xalek din ya pozetîv ya vê gireva giştî, ew bû ku hêzên siyasî li Kurdstanê bi piştevaniya xelkê xebatkar ê Kurdstanê û bi hevgirtîbûa xwe selimand ku pirsên netewî xeta sor in, û bidarvekirina xortên kurd ne tenê nikare baweriya bi hêz ya wan bi azadî û demokrasiyê sist û lerzok bike, belkû dibe sedema vê ku her takek Kurd li her beşeke kurdistanê û di çarçoveya her hêzêk siyasî de bin, bi moral û îradeyek qahîmtir ji caran li dewra yektir kom bibin û dirêjiyê bidne xebata xwe.

www.arsivakurd.org

# Çima Tehranê pêşwazî ji kuştina Bin Laden nekir?

**W: Arîn**

Kovara înternêtî a Dîplomat ku şirove û analîza ser meseleyên welatên Asyayî dike, li gotarek xwe de balê dikişîne ser kuştina Usame Bin Laden ku Îranê ew bi dujminê xwe dizanî!!, lê çima rayedar û karbidestên Komara Îslamî û medyayên wî welatî pêşwazî ji mirina wî nekirin yan ewqas bi parêz ve xwe jê derbas kirin. Ew dide zanîn ku gorî raporan û helwestên fermî ên Îranê derheq mirina Bin Laden li du hefteyên derbasbûyî de riftarên wan ji gelek aliyan ve heyrîmayî, dijî hev û tevlîhev bûn.
Helwestên bi vî rengî hinekê gêjker in.

Bın Ladenê Sunnî û rêkxistina wî ya bi navê Elqaîde li kakila xwe de dijî Îrana şîe bûn û heta kesên girêdayî Bin Laden li sala 2007'an de li dijî Îranê fetwa dabûn. Her çend ku deng û basê vê hindê heye ku piştî kiryara terorîstî a 11' septamberê gelek alîkarî li navbera rejîma Îranê û Elqaîdê de hebûne û bi awayek taktîkî û li berjewendiya hev de alîkariya hev kirine û heta çend endamên malbata Bin Laden û gelek endamên vê rêxistinê bo midehek zaf li Îranê de hatine xwedîkirin.

Bin Laden bi awayek hişk û berçavtengane gorî îdeolojiya xwe li dijî şîeyan bû û Elqaîde û torên ser bi wê li kuştina hezaran şîeyan bi taybet yên Îraqê de tawanbar in. Bi berçav



girtina zaniyariyên han diviya berpirsiyarên Îranê û medyayên hikûmetî li rastî de ji mirina Bin Laden keyfxweş bana, lê çi sedem yan hikmetek li pişt vê meseleya nepenî xwe veşartine?
Bi nêrîna rêberên rejîmê, pirograma navikî û pêgeha rejîmê li asta navnetewî de gelek girîngtir ji parastina şîeyên Îraqê ye. Tehran ji mirina Bin Laden ku dikare bibe sedema bihêzbûna pêgeha yek ji dujminên xwe –rêberek ku şiyanên xwe li derbe xistina bi hewlên etomî ên Tehranê ji riya dorpêçan û operasiyonên nepenî hevdem li gel îzole kirina rejîma Îranê li rêxistina NY de nîşan daye- razî nine.

Wekî xuya rejîma Îranê bi rastî nîgeranê wê yekê ye ku operasiyona dawîn bikare li şansê serketina Obama li hilbijartina serkomariya pêşber de dê zêdetir bike. Li rastî de gelek dijwar e em wusa nefikirin ger ku rêberên rejîma Îranê karîbana û îmkana wê hebana ku li navbera kuştina Bin laden û dorandina Obama li hilbijartina pêşber de yekê hilbijêrin, bê şik dê egera duyemîn anku dorandina Obama hilbijartibana.

Di heman hal de têfikirîna bi gefek leşkirî jî heye. Jeneral li Îranê de divê ji xwe bipirsin ku ger balafir û Helîkopterên Amerîkayî dikarin ji herêma esmanî a Pakistanê re derbas bin, ma çiqas dikişîne ku bikarin sînorê Efxanistanê jî derbas bikin û derbasî Îranê bibin?

Faktera din Pakistan e. Ji ber wê ku veşargeha Bin Laden li kûrahiya çarçoveya xaka wî welatî de bûye, dewleta Pakistanê niha li bin givaşên tund ên Amerîkayê de ye, û Îran jî dikewe hemberî vê pirsiyarê ku gelo Îslamabad ji bo pêşîgirtina rexne û lomeyên zêdetir yên Amerîkayê, nêzîkî Waşingtonê nabe?

Bê şik Pakistan dê bi hişyarî ve pêdeçûnekê bi ser dan û standin û rêketinên xwe bi Îranê re bike û dikare biryarê bide ku çavê xwe li hember operasiyonên rêxistian Cundila li Belûçistanê de biniqîne. Li heman hal de jî dûr nine ku Amerîka ji alavên xwe yê givaşê bo ser Pakistanê bi merema betalkirina rêketina 7 mîlyard û 500 mîlyon dolarî a hêla gazê mifahê bistîne ku li çarçoveya wê de qirar e Pakistan li sala 2015'an de kirrîna gaza siroştî a xwe ji Îranê dest pê bike.
Li gor rewşa nihoyî, berpirsiyarên Îranî sê vebijêrkan li pêşberî xwe de dibînin.
Vebijêrka yekem û ne mumkin, başkirina pêwendiyên xwe bi Amerîkayê re ye. Mirina Bin laden derfetek zêrîn ji bo berpirsiyarên rejîmê pêk anîbû ku dikarîn hevdem li gel pêgeha bêhêzbûyî a Pakistanê, derheq Efxanistanê derbasî got û bêjek micid bin.
Vebijêrka duyem, dest li ser dest danîn û li çavnihêrî de rûniştinê ye ku Obama deskevta dawîn a xwe li propagendeyên hilbijartinê de bixe nimayişê.
Vebijêrka sêyemîn, berfirehkirin û xurtkirina pêwendiyan û hevkariyan bi Talîbanan li Efxanistanê de weke alavek ji bo derbelêdan ji berjewendiyên dawîn ên Amerîka li deverê de ye.

Ji dîtingeha rêberên rejîmê ve, alozî û nearamiyek bilez li rewşa Efxanistanê de dikare derbê ji şansê hilbijartina dubare ya Obama bide. Her çend ku Talîban li bingeh de rejîma Îranê bi dujminê xwe dizane, lê gorî belge û dukomentên bidesthatî li vê dawiyê de, eşkere dibe ku rejîma Îranê ji riya havkariyên locestîkî û şandina çek û teqemeniyan ve alîkariya wan dike.

Nîşane û riftarên rejîma Îranê vê yekê didin eşkere kirin ku ew bi egera bihêz ve dê vebijêrka sêyemîn hilbijêrin.

## Rûsiye naxwaze ku NY derbarê şandina çekan ji Îranê bo Sûriyê raporan bilav bike

**Li gorî raporeke NY Îranê gellek caran ji riya Sûriyê ve çek û teqemenî ji Felestînî û Lubnaniyan re şandiye.**



Nûçegihaniya Royterz bilav kir ku NY dixwaze derbarê şandina çek û teqemeniyan ji aliyê Îranê ve bo Sûriyê raporekê bilav bike lê Rûsiye dixwaze pêşiya bilavbûn raporeke bi vî awayî bigre. Ew rapor ji aliyê wan şareza û karnasan ve hatiye amadekirin ku li ser birêvebirina biryarnameya çarê ya NY de çavdêriyê dikin.
Rûsiye dibêje ku ew rapor divêt berî vê ku bihê bilavkirin di komisyona tehrîmên bi dijî Îranê de bihê baskirin. Hinek dîplomatên rojawayî ser vê bawerê ne ku Rûsiye bi vî awayî dixwaze ji Beşar Esed piştevaniyê bike û navbirî biparêze.

Bo bilavkirina vê raporê divêt her 15 endamên Konseya Ewlekariyê dengê erênî bidin, lewra Rûsiye dikare bi denê "ne" pêşiya bilavbûna vê raporê bigre.

## Fesada Îslamî bi piştevaniya Sipaha Pasdaran

**Sipaha Pasdaran malperek ji bo zewaca demî çê kir**




Piştî wê ku Wezîrê Îtilaat a Komara Îslamî ji alîgirên xwe xwast ku dijî çalakiyên "Facebook"ê bisekinin, çalakên enternîtî bas ji birêvebirina malperek bi navê "Hafizûn" ji aliyê Sipaha Pasdaran ve dikin.
Armanca çêkirina wê malperê, peydakirina hevjînan e bo zewacên demî. Sipaha Pasdaran bi çêkirina malperên cinsî, hewl dide ku ji balkêşiya malperên civakî weke "Facebook" û "tûwîtir" bo ciwanên Îranî kêm bike. Ji aliyek din ve gelek kes ji ewlehiya îtilaatên xwe di nav wan malperan nîgeran in.

# Xak, ziman û ala; xeta sor!



Şehab Xalidî

Yek ji hilbijartinên herî giring û çarenûssaz di Turkiyê de, hilbijartinên parlemanî ne, lê vê hilbijartinê ji bo Kurdan giringiya taybet bi xwe heye.

Partiyên Kurdan di Turkiyê de dixwazin ku bi bidestxistina piraniya dengan di herêmên xwe de, bi deshilatdariya Turkiyê biselmînin ku wan di Kurdistana Bakûr de cîpiyek weha bihêz tuneye, jiber ku bi sala ye ku Kurdan seba daxwazkirina mafên xwe yên rewa digrin, îşkence dikin û heta dikujin û gundên wan jî dişevitînin, û bi riya tepeseriyê hewlê didin ku neteweyek çend milyonî bêdeng bikin.

Ji aliyek din ve Kurd hewil didin ku bi kar û çalakiyên berdewam ên rojane û bi awayek aştîxwazane dengê xwe yê rewa bigehînin wan guhên kerr yên dewletên demokratîk ku naxwazin seba qazanc û berjewendiya xwe deng û hawara azadîxwaziya Kurdan bibihîzin û reng û rûyê vê xebata bihêz û medenî ya Kudan, wek girevên giştî, meşên aram û dûr ji tundûtujiyê, bibînin. Kurd di çarçoveya demografiya Kurdistana Bakûr de, niha bi qurbanîdan û bi vê hemû xebata xwe bi xweşî ve bûne hêzek weha di Turkiyê de ku şiyane û dikarin cîpiyê wan partiyên xeyrî Kurd ku şev û rojan pîlanan bo bêdengkirina Kurdan dadirêjin, weha lêj bikin, ku kêmtirîn alîgirên wan di Turkiyê de hebin. Ew xebat û mandîbûna wan li Turkiyê di rastî de kariye deshilatdarên Turk ew qas bixen jêr zext û fişarê, ku ew hikûmeta ku serdemekê heta axavtina bi zimanê Kurdî jî qedexe kiribû, û bi awayekî berfireh dest bi asîmîlekirina Kurdan kiribû, da ku nasnameya netewî ya Kurdan ji nav bibe, û heta Ataturk digot; ew cihê ku sernîzeya Turk têde hebe li wir pirsa Kurd tunye, lê îroroje em dibînin ku xebata Kurdan dewlet neçar kir ku heya televîzyonekê bi zimanê Kurdî danê, herçebd AKP'ê bi danîna vê televîzyonê gellek armancên xwe ên gemar pêkan, û ew televîzyon ne serbixwe ye û di çarçoveya siyasetên dewletê de kar dike, lê dîsan jî pêngavek ber bi pêşde ye.

Di rastî de vê xebata pirr bi hêz û serdemiyane deshilatdarên Turk ew qas xistiye tengasiyê de, ku hêz û şiyana veşartina pirsgrêkê tune ye, û serokê partiya deshilatdar wate Erdoxan carna bona demokrat nîşandana xwe, di civînên dervay welêt de ragehandiye ku ew dixwazin dawiyê bi siyaseta îmha û înkarê bînin.

Heya YE'ê jî yek ji şert û mercên wan bo wergirtina Tirkiyê ew e ku deshilatdariya Tirkiyê bersiva daxwaziyên Kurda bide û dawiyê bi siyaseta tepeseriyê bîne. Herçend dewletên Ewrûpayî bo qazanc û berjewendiyên xwe çavê xwe li hember gellek siyasetên qirêj de ku li ser Kurdan birêve diçin, ser hev danîne, lê dîsan jî eger carna helwêstê digrin, eva encama berxwedaniya bê rawestan û bi bandor e ku dewletên Ewrûpayî neçar bi helwêstgirtinê dike.



Bandora xebata şaristaniyane ya Kudan li ser havkêşeyên siyasî di Turkiyê de ewqas bihêz bû ku Obama di dema serdana Turkiyê de nekarî Kurdan ji bîr bike, lewra serdana Ehmed Turk û hevalên din yên wî kir da ku ji nêz ve guhdariya daxwazên Kurdan bike.

Partiyên Kurda di Kurdistana Bakûr de niha dest bi xebatek berfireh ya propagendeya hilbijartinê kirine û dixwazin ku roja 12'ê Hizîranê herne ser sindûqên dengdanê, û bi bidestxistina kursiyên zêdtir baştir rolê xwe di warê çareserkirina pirsa Kurd de bilîzin.

Di hilbijartinên parlemanî di 22.07.2007'an de ku 7395 berendaman bo bidestxistina 550 kursiyên parlemanê ketin nava herikiyan; de û ji vê hejmarê, 726 berendam serbixwe bûn û yên din jî ser bi 14 partiyên siyasî bûn, kurdan 21 kursî bi dest xistin, ku ew serkevtinek pirr mezin ji Kurdan re li çav hilbijartinên berê bû. DTP'ê di vê hilbijartinê de nûnerên xwe bi awayê serbixwe berbijar kiribûn da ku hekî nekarin baraja %10 bişkînin, lê dîsan jî bikarin herne parlementoyê. Di vê hilbijartinê de kêrhatiya 50 kes ji berendamên DTP'ê bi tawana bergirîkirina ji mafên netewî yên Kurdan hatibû retkirin ku di nava wan de Leyla Zana, Xetîb Dîcle, Selîm Sadak, û Orhan Doxan hebûn.

Di hilbijartinên parlemanî di sala 2002'an de jî Kurdan beşdarî kirin, lê wê demê wan tenê karîbûn di bajarên Diyarbekir, Muş, Mêrdîn, û Adî Yemanê, kursiyan bi dest bixin, lê mixabin wê demê gellek ji Kurdan bi siyasta AKP'ê hatibûn xapandin û dengê xwe dabûnê.

Di vê hilbijartinê de bû ku AKP'ê karî piraniya kursiyan bi dest bixe û 59'emîn kabîneya dewleta Turkiyê ava bike, ev yek jî di demekê de bû ku AKP di sala 2001'an de ji aliyê Erdoxan û Ebdula Gul û hinek ji kadroyên berê ên partiya îslamiya Rifah bi berpirsayetiya Erbekan, hatibû avakirin, lewra ew yek ji bo AKP'ê serkevtinek bihêz li hemberî partiyên çepgir de bû.

Îsal jî ew partiya deshilatdar di nav hewildanan de ye ku bi awayên cur bi cur û bi dana sozên bê bingeh dengê Kurdan bi dest bixe û piraniya kursiyan bi destve bîne. Lê zehmet e ku Kurd êdî bêne xapandin, jiber ku Kurd nikarin ji bîr bikin ku Erdoxan di dema meşên berfireh ên Kurdan de biryara tepeseriyê dide û bas ji "Yek netewe, Yek xak, û Yek ala" dike, lê di dema hilbijartinana de bas ji çareseriyê dike.

Niha bi xweşî ve di nav Kurdan de siyasetvanên gellek jêhatî hene ku dikarin di qada siyaseta Turkiyê de baş bilîzin û germiyek taybet bidin vê xebata xwe. Siyasetvanên wek Ehmd Turk serokê berê yê DTP'ê û Osman Baydemir şaredarê Diyar Bekir û herweha Leyla zana ew jina ku bi cesûriya xwe naskiriye û cihek taybetî di nav dilê Kurdan de heye. Jiber ku wê 10 sal ji jiyana xwe seba axavtina bi zimanê Kurdî û berevanîkirina ji mafê gelê xwe di girtîgehê de derbas kir.

Leyla Zana îsal jî berendama endametiya di parlementoyê de ye. Herçend di destpêkê de, Komîteya Bilind ya Hilbijartinên Turkiyê (YSK), berendamiya 12 kandîdên Kurd ji wan ya Leyla Zana, Hatîb Dîcle, Gulten Kişanak, Şerafetîn Elçî, Sebahet Tuncel, Ertugrul Kurkcû û Îsa Gurbuz ji ber cezayê wan yê hepsê ret kir, lê ew biryara YSK'ê rastî reaksiyona hin rayedarên Kurd yên Tirkiyê ji wan Ehmed Turk serokê Kongera Civaka Demokratîk û Selahedîn Demirtaş serokê BDP hat û piştî vê jî nerazîbûn li hemberî biryarek bi vî awayî de gihîşte astekê ku YSK'ê pêdaçûn bi ser vê biryara xwe de kir û piştî vê ew biryar ku di rastî de biryarek ne hiqûqî, belkû siyasî bû hilweşand.

Bê guman ew xebata bê rawestan ya siyasetvanên jêhatî ên wek Ehmed Turk, Baydemir, Leyla Zana, Serafetîn Elçî û Bozyel, û... wê bibe sedema vê ku Kurd bi hişyariyek zêdetir û emegdarbûna bi nasnameya xwe ya netewî û baweriya bi xak, ziman û alaya xwe di hilbijartinan de beşdariyê bikin û serkevtinên zêdetir ji salên borî bi dest bixin.

## Dadgeha Federal a Amerîkayê:
## Xamineyî û Sipah tawanbarên piştewanî ji encamderên 11'ê Septamberê

**Elî Xamineyî û spaha pasdaran hatine tawanbar kirin ku piştî 11'ê Septamberê piştewanî ji endamên Elqaîdeyê kirine.**

Piştewaniya malî, penadan bi malbata BinLaden û herweha gelek ji endamên Elqaîdeyê, piştewaniya leşkirî û locestîkî ji Elqaîdeyê bona domandina êrîşên leşkirî yên wan li dijî hêzên Amerîkayî li Îraq û Efxanistanê de beşek ji wan tawanan in ku rejîma Îranê pê hatiye tawanbar kirin.

Dosyeya han ku li ser xwasta malbatên goriyên bûyera 11'ê Septamberê bi hevrêtiya pêtir ji 70 parêzerên Amerîkayî, Îranî, Kanadayî û Birîtanyayî hatiye amadekirin û bê şik yek ji mezintirîn dosyayên qezayî ên dîroka Amerîkayê ye ku pitir ji 5 salan û 36 hezar seetan dem jêre hatiye terxan kirin; herweha 120 çalakên siyasî, rojnamevan,lêkoler û şirovekarên terorîzmê û herweha endamên berê yên Elqaîdeyê, Wezareta Îtilaat û Spaha Pasdaran û çendîn kesatiyên berçav yên berêye Komara Îslamî têde şahidî û gewahyarî dane.

Li vê dosyayê de Xamineyî û du wezîrên wê demê (Xerazî û Mutekî), du fermanderên wê demê yên Sipaha Pasdaran (Rehîm Sefewî û Ceiferî)û fermanderê hêza Quds li nav tawanbarên sereke de ne.

# Karnameya reş a Komara Îslamî li rapora nû ya Efûya Navnetewî de

**Binpêkirina mafê mirovan û azadiya bîr û rayê, bi taybetî destbiserkirina rojnamevan û çalakvanên medenî û binpêkirina mafê kêmaniyan di Îranê de berdewam e.**

Efûya Navnetewî Saziya Berevankarê Mafê Mirovan di rapora sala 2011'an ya xwe derbarê Îranê de îşare bi doma binpêkirina mafê mirovan û azadiya bîr û rayê, bi taybetî destbiserkirina rojnamevan û çalakvanên medenî û binpêkirina mafê kêmaniyan kiriye.

Di vê raporê de hatiye ku hikûmeta Îranê bi çavdêriya bi ser ragehandinên navxweyî û sînordarkirina destpêragihîştina xelkê Îranê bi ragehandinên derve, ji rabihurî zêdetir têkiliya wan bi cîhana derve re qut kiriye.

Herweha berpirsyarên rejîma Îranê nûçeya îdama 252 kesan di sala borî de piştrast kirine. Lê bi vî halaî jî Efûya Navnetewî dibêje ku raporên bi belge di dest wan de hene ku nîşan didin pitir ji 300 îdam di vê qonaxê di Îranê de birêve çûne.

Efûya Navnetewî herweha îşarê bi dadgehîkirinên ne dadperwerane di sala 2010'an de jî kiriye, wate dadgehên ku bi bê amadebûna parêzer, yan jî li jêr zexta dadwer de birêve çûne.

Di vê raporê de îşare bi îşkenceyên wek ragirtina



girtiyan di ciyê teng, destdirêjiya îcnsî yan jî xwarkirina serê girtiyan bo nav kasa WC'ê de jî hatiye kirin.

Nûçeya girtina endamên Sendîkaya Kedkarî, çalakvanên mafê jinan, û berevankarên mafê girtiyan jî di raporê de hatiye.

Herweha îşare bi destbiser kirina kêmaniyên netewî, û sepandina ferq û cudahiyan bi dijî kêmaniyên mesebî wek Mesîhî, Sunnî, ruhaniyên cudabîr ên Şîe, Derawîşên Gunabadî, û Behayiyan, û cezayê bidarvekirinê di sala 2011'an de hatiaye kirin.

# Seid kurê mezin yê Bin Ladin, di Îranê de ye

**Nûçegihanê "Elerebiyê" ragehand , kurê Bin Ladin yê bi navê Hemze ne diyare ku niha li kîderê dijî, lê hinek dibêjin ku ew dîsan çûye Îranê.**

Hemze temen 22 salî ku gumana vê hindê heye ku di dema êrîşa bo ser Bin laden ew jî di gel Bin Ladin bûye, heya niha kes nizane ku li kuderê dijî.

Kurê herî naskirî yê Bin Ladin ku navê wî Seid e, niha di Îranê de dijî û bi keça " Îmen Elzewahêrî" rêberekî din ê Elqaîdeyê re zewicî ye, lê niha ne diyar e ku hevjîna wî jî li kuderê ye.

Niha xûşka Seid ya bi navê Îman û sê birayên wî ên biçûk di gel wî jiyanê dijîn.

Li gorî zanyariyan ew hevjîna Bin Ladin ya bi navê "Xêyriye" ku di gel wî jiyan dikir, niha di destê dezgehên emniyetî ên Pakistanê de ye.

Hevjîna Bin Ladin ya din bi navê "Emel Ebdulfetah" ku xelkê Yemenê ye, niha bi pênc zarokên xwe re di Pakistanê de dijî. "Seha" naskirî bi "Om Xalid" xelkê Erebistana Seudî , hevjînek din ya Bin Ladin e ku kurê wê wate Xalid di gel bavê xwe hate kuştin. "Seha" berê jina yek ji fermandeyên Elqaîdê bû ku piştî vê ku mêrê wê di Wezîristanê de hat kuştin, bi Bin Ladin re zewicî.

Rojev

# Cinayetên rejîma Sûriyê û helwesta lawaz a cîhanî



Selîm Zencîrî

Piştî borîna du mehan bi ser nifûza ''bihara Erebî'' û pêlên demokrasîxwaziya deverê bo Sûriyê de (welatek ku têde malbatek zêdeyî çar dehsalan e desthilat qorix kiriye û gelên Sûriyê jî ji her terze azadî û mafek berheq bêpar hiştiye û serêşiyek mezin jî bo civaka cîhanî afirandiye, çunku yek ji piştevanên rastîn û şandekarên terorîzma navnetewî ye), her ku diçe nirxa wê ji bo gelên Sûriyê zêdetir û asta cînayetan jî berfirehtir dibe.

Hikûmeta Beşar Esed serbarê soz û peymanên derbarê hin reforman, lê her wek hikûmetên totalîter ên din xwenîşandan û daxwaza ''azadî' a xelkê bi fitne û pîlana derekî û dujminan da zanîn û her deriyek ku bikare alîkariya çareserkirina vê kirîzê bike, bi ser xwe de daxist û bi zora çek, top, tank û serkutê ve bersiva daxwaziyan û ber bi rûyê xwepêşandanên aştîxwazane yên xelkê bû ku heya niha nizîk bi hezar kuştî û bi hezaran birîndar û girtî li pey re hatine.

Reaksiyon û pêngavên Beşar Esed wusa nîşan didin ku ew ji bo parastina xwe û rejîma hov a xwe penayê dibe ber her rê û cih û uslûbek tund û tûj û selmandiye ku ji cînayet û tawanên dijî mirovahiyê de ne kêmtir ji hevalên xwe yên dîktator û bi taybet hevtayê xwe yê Lîbyayî û Îranî nine.

Lê ya ku girîng û cihê dahurandinê ye, helwesta lawaz a cîhanî yan awayek ji bêdengî û çavniqandina wan e li hember cînayet û bûyerên dilêş û wijdanhejîn ên Sûriyê de, bi awayek din em dikarin bibêjin ku rejîma Esed ji bo tepeserkirin û serkutê jî piştewaniyek bihêz a cîhanî ve piştqahîm e, dijberiya Rûsiye û Çînê û bikaranîna mafê Veto a wan li hember pesendkirina biryarnameyek li Şêwra Ewlekar a NY de li dijî tawanên hikûmeta Sûriyê mînaka eşkere û berbiçav a vê piştewaniyê ye.

Lewma mehkûmkirina devkî û tehrîma çend berpirsên Sûriyê ji hêla Amerîka û Ewropayê ve renge weke destpêk baş bin, lê hêdî û sembolîk û li hamn dem de jî ji bo pêşgirtin ji rijandina xwînê û cinayetên hovane, girtin, îşkence û serkutê sitewr(nezok) û herweha bêpar in ji vê micidî û qatiîyetê ku paşekişiyê bi rejîmê bike.

Ji aliyek din ve piştî ewqas cinayetan li van du mehan de, mixabin em dibînin ku rojava hêj bi çavê reform û çaksaziyên formalîte ve mêzeyî hikûmetê dike û heya qasekê jî li vê derheqê de hêvîdar e. Ji ber ku heya niha komkujiya Sûriyê bi tawan dijî mirovahiyê nenasîne û xirabtir ji hemûyan jî hêj em dibînin ku endamê Şêwra mafê mirov a NY ye.

Lewma ji mirov re dibe pirsiyar ku heya kengê Rojava û civaka cîhanî dê wiha bêdeng bin? Dibe çend hezar kesên din bên kuştin heta ku hesta mirovdostî û atîfeya wan bibiziwe û gavek bi piratîk bawêjin? Heta kengê dê bi van helwestên mirî û neşûndaner ên xwe rewatî û şerîyetê bi wan rejîman û cînayetên wan bidin? Gelo mafê mirov û berevanîkirin jê, tenê wê demê rewa ye û dibe rêz jê bihê girtin ku hevterîb be li gel berjewendî û siyaseta superhêzan?

Heya ku dibe mafê mirov bibe goriyê dan û standinên siyasî û aborî? Yan çima berevanîkirin ji mafê mirov ji cihekê ve bo cihek din yê coxrafiyayî ferq û ciyawazî hebe? Û ....

Bi giştî herwekî rejîma Esed heya niha nîşan daye ku xincî xwîn, rondik, talan û terorê tu tiştek ji bo xelkê Sûriyê û cîhanê li tûrikê wê de nebûye û ji bo parastina desthilata xwe, dest ji tu cinayetekê naparêze û amade ye heya dawîn rawestgeha serkutê jî biçe, lewre li rewşek wiha hewcehî bi helwestek jêhatî û lêbraw a cîhanî li hember rejîma Esed de dike û ji her şêwaz û rêçareyek ku bikare alîkar be bo pêşgirtina afirandina cînayetên zêdetir û herweha serketina Bihara Erebî û tevgera demokrasîxwazî li wî welatî de mifahê bistînin û vê rejîmê îzole bikin û çi din rê ji bo lekedarkirina berpirsatî û kerameta mirovheziya xwe xweş nekin.



www.arsivakurd.org

# Mezintirîn pirsgirêka jiyanê di dema îro de





Sefiye Xalidî

jiyana îro ku bi alîkariya zanist û teknolojiyê, roj bi roj pêş dikeve û li pey xwe derfet û îmkanên nû ji bo jiyanek baştir datîne xizmeta mirovan, lê istrês(dilkute) mezintirîn pirsgirêk e ku di jiyanê de xuya û berçav e, ku di vira de emê amaje bi çend xalan bikin.

**HILBIJARTIN**

Mirov serbixwe û azad e. Di gel her hilbijartinekê de istrêsek jî heye, jiber ku hilbijartin tiştek hêsan û asayî nine, bi taybet di biryarên giring û mezin mîna (kar û zewacê û....) ku her hûrbînî a pêwîst bi kar tunebe, jiyana mirovan xirab dibe û pirsgirêkên hundurîn yên ne baş bi xwe re tîne.

**BERPIRSIYARÎ**

Pejirandina berpirsiyariyê pirsek dinê ye ku piştî hilbijartinê derdikeve holê, kesê/î ku hildibijêre û berpirsatiyê digire ser milên xwe, lazime bi baştirin şêwe erkê xwe bi cî bîne.

**BERÇAVGIRTINA YASAYAN**

Dema însan pê datîne ser wê topa axê, ji dil yan ne ji dil, dibe bi hindek qanûn û zagonan pêbend û bawer be, û xwe li hember wan berpirs bizane. Tevî wan xalên hene ji boy ku di nav civakê neyê havêtin û bikaribe jiyanek hêmin bike pewîste pêbend bi wan destûr û zagonan be.

**TENÊTÎ**

Istrêsa tenêtî bixwe du naverokên cuda ne, yek tenêtiya fîzîkî û a din tenêtiya felsefî ye.

Di tenêtiya fîzîkî de tirsên ku mirovan hene nebûna heval û kesên nêzîk û malbatî ne, bo mînak (kesek di hepsê de û li hucreyên takekesî de be, yan jî mirina kes û karên nêzîk û malbatî....) lê ew tenêtî tê dermankirin.

Lê di tenêtiya felsefî ku mirov di civakê de ye, di wê tenêtiyê de dibe ku mirov bi malbata xwe û hevalên xwe re be, lê ew tenêtî û hestên wê yên xirab wî/wê bi tenê nahêle, sedema wê jî dikare di famnekirin û jihev tênegihîştina mirovan li hember hevdu be, ku mixabin ew tenêtiye bi zehmet tê dermankirin.

**XERÎBÎ**

Xerîbî û xurbet li rêza dan û standinên fîzîkî ên mirovan de ye, kesên ku di welatên biyanî de dijîn û ji malbat û kes û karên xwe dûr mane, hertim barê xem û kovanan bi xwe re digerînin.

**TÊKÇÛN**

Istrêsên hundurîn pir caran çavkaniyê ji wan armanc û daxwazan digire ku mirov ew di mejiyê xwe de ava kiriye! lê belê bidestveanîna ewan daxwzan derwey hêza wê ye, ku hinek cara ewqas dûr ji rastiyen e ku nikare bi dest bîne. Rastî girift û xwe nebaweriyek mezin dibe.

**ŞER Û CENG**

Di dirêjahiya dîrokê de şer û ceng yek ji diyardeyên wêranker ê ruhê mirovan e, bi vê wateyê ku her gav di cihekê li cîhanê şer û ceng çe bibe bêguman tesîr û şûnpiyên wê yê nebaş li ser hizir û ruh û ramana mirovan dimîne û dilperîşaniyek hetayî di mirovên dilreq de jî çê dibe.

**HEJARÎ**

Di jiyana maşînî a îro de hejarî yek ji diyardeyên istrêsê ye. Hejarî, belengazî, xizanî ji mînakên din ên istresê ne ku jiyanê ji mirovan tal û heram dike û derbê ji têkiliyên mirov di civakê de dide.

**ZEXT Û GIVAŞ**

Yekek din ji diyardeyên istrêsê di jiyana îro di civakê de zext, zorî û kiryarên di wê rêze de ne, bo mînak (di noba otobûsê û herwiha îdareyên dewletî de......) zext bi awayek rohn û berçav tê hestkirin.

**BENGDAWÎ BI MADEYÊN BÊHIŞKER**

Weke pir biêş û jantirin istrêsa jiyana modern û pêşkevt bûye sedema birîndarkirina ruhê mirovatiyê! bikaranîna madeyên hişber tenê tunebûna kesekê/î nine, belkî nêzîktirîn kes û dûrtirîn kesên wî/wê jî di nava dunyayek bi tirs û xof de dihêle, û kiryarên wî/wê barek ji istrêsê li ser civakê de zal dike. Riyên berxwedaniya li hember istrêsê û diyardeyên wê mezintirîn aloziya vî serdemî ye!!. ger bibêjin awayên bergiriyê ên kilasîkî hene, ew yek rast e, jiber ku ev tişt bi awayek giştî her roj berfirehtir dibe.

Baştirîn riyên bergirî ji istrêsê bi vî awayî ne:

1.(bi hezkirina xwebaweriyê) ku mirov li hember zext û gîr û giriftên civakî de diparêze.

2.(Sport )ku dibe sedema wê ku mirov leşek sax û ramanek şa habe.

3.(Mûzîk) guhdariya mûzîkan jî yekek ji baştirîn riyên kuştina istrêsê ye.

# Mo'tadekê zarokê xwe yê sê salî şevitand

**kesek ku moitadê madeya şîşeyê bû, zarokê xwe yê sê salî şevitand**

Di vê bûyerê de ku li Kerecê rû da, ew zarok ji sedî 85'ê pitir şevitiye û li gorî gotina pizîşkan îmkana zindîmana wê gellek kêm e.

Wî moitadî piştî şevitandina zarokê xwe bi benzînê agir berda leşê xwe jî, ku rêjeya şevitîna wê ji sedî 50 hate ragehandin û di rewşek pirr xirap de ye.

Li gorî nûçeyan, şerê di navbera kesê moitad bi hevjîna xwe re bûye sedema wê ku navbirî zarokê xwe yê sê salî bişevitîne.

# Dezgehên ragihandin û hizrên giştî

W: Sadiq Vehdanî

Pêwendî di navbera dezgehên ragihandin û hizrên giştî mijarek e ku heyameke dirêje gelek pirsiyaran bo lêkolerên civaknasî çêkirine. Bandora dezgehên ragihandinê li ser hizrên giştî eyan e, lê diyarîkirina qasa bandora wan dezgehan li hember mîkanîzmên din cihê lêkolîneke zanistî ye.

Sê qonaxên lêkolîn li ser vê mijarê:

1-Bi bandorbûna %100 a dezgehên ragihandinê li ser hizrên giştî: Nêrîna han li heyama şerê Sar û li salên 1920 heya 1943'an a Zayînî bi girîngîdan û keşifkirina siyasetvanên Bilûkên Rojhilatê ve dest pêkir. Wê qonaxê piştî lêkolînên berfireh ên "Lazar Sifild" û bi redkirina nêrîna han tewaw bû.

2-Qonaxa duyem nêrînek bû ku ji aliyê "Lazar Sifild" ve derketibû holê û bawerî bi kêmbandorbûna dezgehên ragihandinê li ser hizrên giştî hebû. Helbet wê demê Televîziyon di refa dezgehên ragihandinê tunebû û bas li ser Radyo û çapemeniyê bû.



3-Qonaxa sêyem bi hatina TV di refa dezgehên ragihandinê de dest pêkir. Di wê qonaxê de lêkoleran pêdagirî li ser tevlîhevbûn û zehmetbûna diyarîkirina qasa bandorên dezgehên ragihandinê li ser hizrên giştî dikirin.

Rola du aliyane a dezgehên ragihandinê

Dezgehên ragihandinê weke alavên îtilaatî û tefrîhî bi kar tên.

Her kesek bi têkiliyên îtilaatî tevî kesekê/î din derbarê bûyerên cur bi cur ên cîhanî, hizrek di nav xwe de perwerde dike, lê *pêwendiyên* han bi zaniyariyên ku ji aliyê dezgehên ragihandinê ve werdigrin, çavkanî digre.

Piras û Rabirts, du lêkolerên vî warî de dibêjin ku dezgehên ragihandinê ên giştî bi cihgirtin di navbera siyasetvanan û xelkê de, du karên bingehîn li pêkanîna hizrên giştî encam didin. Yekem rola raporî a xwe dilîzin, wate pêşkêşkirina nûçe û şiroveyên xwe di warê bûyerên cur bi cur û kiryarên siyasî de. Duyem jî ev e ku dezgehên ragihandinê rola nirxandina hizirînên xelkê dilîzin, wate rewşekê pêk tînin ku hemû kes ji bîr û fikirîna xelkê haydar bin.

Ev rola dezgehên ragihandinê bi birêvebirina nirxandinên amarî, awayek fermî bi xwe ve digre, lê gelek caran jî ji riya got û bêj li gel xelkên "kolan û bazar", bi awayek nefermî serjimêrî dikin. Ew du rolane tewawkerê hev û du ne û îmkana vê yekê dide ku pêwendiyek du cemserî di navbera karbidestên siyasî û xelkên hevrê û dijberên desthilatê de bihê pêkanîn.

www.arsivakurd.org

# Hat û çûna tirumbêlên kevn li Îranê

W: Kawe

Raporên saziyên jîngehî û tirafîkî nîşan dide ku pilanên komkirina tirombêlên kevn di Îranê de gellek sernektiye û piştî 10 salan hewildan bo komkirina tirombêlên kevn tenê karîne 1 Milyon ji wan tirombêlên di nav bajarên Îranê kom bikin û niha jî 4 Milyon tirombêlên kevn li Îranê hene ku nêzîk bi du Milyon ji wan li Tehranê de ne.

Tirombêlên kevn du beramberê şevata standardê, binzîn dişevtînin û yek ji sedemên herî girîn bo pîskirina jîngehê tê hesibandin.

abûriya xelkê bûye sedema vê yekê ku xwedîtirombêlên kevn, nekarin tirombêlên xwe biguherin.
Temenê standard yê her tirumbêlek navbera Pênc heya deh salan e, lê em dibînin ku tirombêlên bi temenê pêtir ji 30 salan jî di Îranê de tên bikaranîn ku ev mesele ji aliyê ewlehiya tirombêlan jî cihê girîngîdanê ye. Îran li pileya yekem a tesadufên cadeyî di cîhanê de cih girtiye ku yek ji sedemên wê bûyerê bikaranîna tirombêlên kevn e.
Herweha zahir û rûyê bajaran bi hebûna tirumbêlên kevn ne tiştekê birewş e.
Nebûna sîstemek dirust a Taxî han



daye ku bikaranîna tirumbêlên kevn ên taybetî(şexsî) bo veguhastina musafiran zêdetir bibe.
Hêjayî gotinê ye ku pirraniya xwedîtirombêlên kevn ji tirumbêla xwe weke alavek bo berhevkirina hewcehiyên jiyana xwe mifahê distînin.
Di rewşekê weha de hikûmet divê bîr li bingeha abûrî a xelkê bike û bi bikaranîna rêçareyên demkî, ev pirsgirêk nayê çareserkirin.

Tehran yek ji pîstirîn bajarên cîhanê hatiye naskirin û yek ji pirsgirêkên herî girîng di wî bajarî de pîsbûna etmosferê ye. Bêguman hat û çûya pêtir ji 2 Milyon tirombêlên kevn bo pîskirina bajarek mezin wek Tehranê bes e.
Rejîma Îranê jî di pîlanên xwe de bi mifahwergirtin ji rêçareyên cur bi cur weke bêhitbarkirina kartên şevatê, dana pere bi xwedîtirombêlên kevn û ..., hewl daye ku wan tirombêlan li ser şeqaman kom bike. Lê rewşa xirab a

# Armancdarkirina yaraneyan û rewşa xirab a civakî

Bi derbasbûna pêtir ji 4 mehan ji birêvebirina pirojeya "Armancdarkirina yaraneyan" tu yek ji sozên ku ji aliyê dewletê ve hatibûn dayîn cî bi cî nebûne.
Berhemanîna Zêdetir, jordeçûna asta asûdeyî, jinavbirina bêkarî, jordeçûna asta zanistê û ...ew soz bûn ku dewletê bi awayek sîstematîk û berferih di dezgehên ragihandin ên xwe de bo rêxewşkirin û razîkirina xelkê radigihandin.
Li gor raporên Remî ên berpirsên hikûmetî ên Komara Îslamî bixwe piştî çar mehan ji birêvebirina pirojeya han pêtir ji 14.5 Milyon kes di Îranê de di rewşek xirab a abûrî de dijîn û hejarî bi awayek reha heye.

Berpirsê Komîsyona Abûrî a Giştî ya oda Bazerganiya Komara Îslamî ragihand: Serbarê hewlên dewletê bo kêmkirina asta bêkarî li Îranê, nirxa bêkariyê berdewam dibe û 14.5 Milyon kes li Îranê di hejariya tewaw de dijîn. Lê em dizanin ku amarên rastî ên hejariyê li Îranê li gor standardên rifaha abûrî gelek zêdetir ji amara ragihandî ji aliyê berpirsên Komara Îslamî ve ye.

Li pey jordeçûna amara bêkarî li Îranê em şahidê bandorên bêkarî li civakê de ne. Bo mînak jordeçûna %20 a curm di şeş mehên derbasbûyî de nîşan ji vê yekê dide.
Husênelî Şehryarî, berpirsê Komîsiyona Saxlemî a parlemana Îslamî ya Îranê dibêje: Bi giranbûna alavên xwarinê û madeyên pirotiînî rewşa xwarina xirap bi taybetî li qeraxên bajaran û deverên bêpar bi wayekî berçav jorde çûye.

Di pirojeya armancdarkirina yaraneyan biryar wusa bû ku %30 ji dahata vê terhê para beşa berhemanînê ya welat be lê dewlet bi domandina siyaseta popolîstî û berbirûbûn li hember kêmbûna bûdcê, %80 ji dahatên vê terhê bi şêweya nextî didin xelkê û di rastiyê de bo beşa berhemanînê tu piştevaniyek nehatiye kirin.
Pêkahatina rewşek xirab a abûrî bûye sedema pêkhatina diyarde û kirîzên civakî li welat de û berhema armancdarkirina yaraneyan tenê tûşbûna civakê bi kirîzên cur bi cur bûye.

Bi tunebûna navendên xweser ên serjimêriyê bo bidestxistina serjimêriyek rast bi dewletê îmkana vê yekê daye ku bi ragihandina serjimîriyên nerast, qeyranên civakî red bike.

Îran welatek e ku li pileya yekem a bikaranîna madeyên hişber di cîhanê de ye, erê gelo ma eva nîşaneya qeyrana civakî nine? Erê gelo pirsgirêkên civakî tu girîngiyek bo dewletê hene? Û dewlet bandorên terhên abûrî li ser pirsên civakî dibîne?

# Asta bêkarî di nav netewên Îranê de zêdetir e

Li gor amaran, parêzgehên ku netewên nefars ên Îranê tê de dijîn pêtirîn amara bêkarî hene.
Li raporên amarî ên nirxandina bêkarî li Îranê eyan bûye ku amara bêkarî li parêzgehên Azerbaycana Rojava, Zencan, Kurdistan, Xozistan, Sîstan û Belûçistan û deverên din ên netewên Îranê, amara bêkarî pêtir in.

**Her kes du Demjimêran li hefteyek kar bike ne bêkar e!!**

Dewlet bi ragihandina pênaseyên nedirust û şaş ji "Bêkarî û Kar" dibêje: Her kes ku li hefteyekê de du demjimêran kar bike ne bêkar e.

**Pirsgirêkên civakî jiber bêkariyê li wan deveran de**

Dewlet tu pilanek giştî bo afirandina kar tune ye. Bêkarî li bajarên mezin jî heye, lê li deverên Kurdakincî û... ku niha jî dewlet bi sedemên siyasî bi çavek "nexweyî" li wan mêze dike, tu pilanek abûrî bo wan deveran tune ye.
Koçkirina beşek zor ji hêzên karî ên ciwan, bêkarî, xwekujî û... pirsgirêkên civakî ne ku bi sedema tunebûna kar li wan herêman xûya ne.

Herweha birêveberiya kar û barên dewletî li wan deveran bi stûyê birêveberên herêmên din ên Îranê ye û bikargîrî ji pisporên herêmî li wan deveran kêmtir ji %10 e.

**Bêkarî jî berhema cudahiyên netewî ye**




Dewlet bi birêvebirina siyasetên abûrî ên navendî, tu girîngiyek bi herêmên din ên Îranê bo sermiyandanîna abûrî nade.
Seferên Ehmedînijad bo parêzgehên cur bi cur ên Îranê jî tenê bi armanca teblîxatên hikûmetî bû û tu nîşaneyek ji kêmbûna asta bêkarî diyar nine.

Sozên mezin yên Ehmedînijad li sala 1385'an a Rojî di hevpeyvîneke televîziyonî de ku heya sê salên din bêkarî li Îranê namîne, bi derbasbûna 5 sal ji wê demê, ne tenê bêkarî ji nav neçû, belkî bi berçavgirtina pênaseya dewleta Ehmedînijad ji karmend ku dibêje (her kes li hefteyek de du demjimêran kar bike nebêkar e), asta bêkarî gelek jî zêdetir bûye.

## Hunermend Bêwar Îzet:

# Ji ber wê ku di dema ji dayîkbûna min de, bavê min penaber û di rastî de bê war bûye, navê min kirine Bêwar




Hevpeyvîn: Ceifer Mubeşirniya

## Ez mijûlî berhema xwe ya yekemîn im li Istembolê

Zaf in ew gencên Kurd ku taze derbasî qada hunerê dibin û dixwazin rola xwe li xizmeta bi çand û hunera Kurdî de bilîzin. Yek ji wan hunermendên genc û dengxweş Bêwar e ku me hatina wî bo Kurdistanê wek derfetekê zanîn da ku bi wî re hevpeyvînekê pêk bînin.

**Bêwar di bersiva yekem pirsa me de ku gelo hunermend Bêwar Îzet li kuder ji dayîk bûye û dewrana zaroktiya xwe çawa derbas kiriye, birêzî got:**

Li sala 1975'a zayînî di encama êrîşa rejîma Beis a Bexdayê de bo ser Kurdistana Başûr bi taybetî deverên ku şoreşên mezin têde serî hildabûn de, malbata bapîrê min weke hemû ew xelkê ku wê demê aware û derbider bûy, derbasî welatê Îranê bûn û li Kurdistana Rojhilatê akincî bûn.

Li wir bajarokek bi navê "Zêwe" li deşta "Mirgewer" a ser bi bajarê Urmiyê heye, ku wê demê kempên taybet bi penaberan jê hatibûn avakirin. Malbata me jî di vê kempê de jiyan kiriye.

Lê gelek kevintir ji wê demê hin ji malbatên gundê Sitûna ser bi devera Barzan a Kurdistana Başûr, derbasî Kurdistana Rojhilat bibûn, ku sala 1975'an bav û bapîrên me li wir hev peydakiribûn û xizmatiya xwe xurttir kirin û heya niha jî berdewam e, di vê xizmatiyê de bûye ku bavê min li gel yek ji wan malbatên xizmên kevnar ên Kurdên Rojhilêatê jiyana hevpar pêk anîye û ez li bajarokê "zêwe" di penaberiyê de ji dayîk bûme û dewrana zaroktiyê jî weke her zarokek din ên wan penaberan me derbas kir û pirr nexweşî me dîtin, lê di heman dem de jî piştî sala 1991'an di encama şoreşa xelkê Kurdistana Başûr de ev para Kurdistanê di bin destên xwînmijan de rizgar bû û em sala 1992'an zivirîn ser cih û warên xwe û me hin xweşî bi çavên xwe dîtin, lê ez ji bîr nakim ku parên din ên Kurdistanê hêj bindest in.

**Dema ku mirov navekê bo zarokên xwe diyarî dike, mirov ji manaya vî navî armancek heye, gelo armanca binavkirina Bêwar Îzet jî tiştek wiha ye? Bêwar dibêje:**

min di jor de bas kir û jiyana bav û bapîrên min çawa derbas bûye, belê armanc ji binavkirina min wate "Bêwar" rast ev yek e ku di dema ji dayîkbûna min, bavê min penaber bû û di rastî de bê cih û war bû, lewma navê min Bêwar danîne û ez vê yekê jî zêde bikim ku di mala xwe de ez zarokê herî mezin im.

**Bêwar Îzet li ser jiyana xwe ya niha dibêje:**

Li sala 2004-2005"an ez bi viyana xwe çûme Ewropa û li welatê Swîsê akincî bûm û heya niha jî ez her li wir dijîm. Jiyana min li wî welatî jî xweş e û ez jiyana xwe bi xweşî derbas dikim, lê tu car navê welat û warê mirov bixwe, çimko dûrî ji qewm û kes û malbatê birastî karek zehmet e. lewma piştî wergirtina regeznameya swîsî, ezê vegerim Kurdistanê û di vê beşa azad a Kurdistanê de ezê jiyana xwe bidomînim.

**Di beşa pirsên hunerî de, hunermend Bêwar Îzet, jiyana xwe ya hunerî wiha anî ziman:**

Her di temenê zaroktiyê de min hez ji hunera sitrangotinê dikir û di sala 2002'an de ez bi awayek fermî ketim nava hunera sitrangotinê de û piştî 2 salan wate sala 2004'an min sitrana "Mercanê" bi kilîp tomar kir û min bo yekemîn car bi di vê riyê de nav û deng derxist.

**Bê guman di her kareke de, hin hevkar û kesên emegdar li derdora mirov hene heya ku mirov bikare di karê xwe de bigîje astek baş, Bêwer Îzet jî yek ji wan kesan e. Navbirî jî ji bo vê yekê, tenê amaje bi kesekê kir û got:**

Birayê min yê hêja mamosta Sebah Babêzînî ji bo min weke pirekê bû ku ez derbasî nav hunera strangotinê bibim, heya niha jî stranên min hemû ji peyv û awazên wî ne.

**Li ser berhemên hunerî ên tomarkirî ên taybet bi xwe, Bêwar xuya kir:**

Min heya niha tu albomek nine, û pirraniya stranên min bi deng in û hin ji wan jî min kirine kilîp li medyayan belav kirine. Lê niha ez mijûlî berhema xwe ya yekimîn im li bajarê Istambola welatê Turkiyê ku ev berhem jî her bi hevkariya mamosta Sebah Babêzînî dê bihêt tomarkirin.

**Li ser strana xwe ya bi nav û deng, "Mercanê" Bêwar Îzet got:**

Ev stran peyvên mamosta Sebah û awaza wê fulkulor e û berhema kompaniya Çarçira bû, di riya rojnameya we de ez sipasiya kompaniya Çarçira dikim bi taybetî xwedê jêrazî kak Îrfan ku piştî wê kilîpê çû ser dilovaniya xwe.

**Mûzîka Kurdî û mûzîka Ewropî cudahiyên zaf hene, lê cudahiyên di navbera wan hunermendê Kurd ên derveyî welat li gel ên navxwe ê Kurdistanê, bi raya Bêwar Îzet çawaye?**

Di navbera mûzîka Kurdî û Ewropî de cudahî zaf in, lê di navbera hunermendên Kurd ên derveyî welat û navxwe ya Kurdistanê de, hin cudahî hene û vedigere ser dezgehên tomarkirinê. Çimko amêrên herî baş li derveyî welat pêtir dest dikevin. Di warê strangotinê de jî ez cudahiyek wusan nabînim. Ya girîng ev e ku hunermendên Kurd xizmeta mûzîka netewa xwe û welatê xwe bikin, çi ji derveyî welat bin û çi di nava Kurdistanê bin.

**Pêşkevtin û asta mûzîka Kurdî di dema niha de jî bi raya hunermend Bêwar Îzet wusan e:**

Cîhan berbi pêş çûye û hêj jî ber bi pêşve diçe. Pêwîst e ku mûzîka Kurdî jî ji wî karwanê pêşkevtinê pare nemîne û xwe pêş bixe. Bi raya min niha mûzîka Kurdî di astek baş de ye ku ez hêvî dikim ber bi pêş ve here û baştir bibe.

**Bêwar ji çi welatek cîhanê hez dike?**

Kurdistan- Siwîs

**Tu ji çi hunermendek Kurd pirr hez dikî?**

Hemûyan

**Ji çi demek rojê pêtir hez dikî?**

Êwaran

**Xwarina li gor dilê te?**

Dolmê Kurdî

**Rengê dilxwaze te?**

Sipî

**Hez dikî yekim car bibî bavê xortekê yan keçekê?**

Ferqa wan tune ye

**Li gel spasî û mandînebûniyê û herweha hêviya serkevtina li kar û barên hunerî û taybetî ên te de, gotina dawîm**

Ez jî gellek sipasiya we hemû karmendên rojnameya Agirî dikim û hêviya serkevtinê ji bo we hemûyan dixwazim û her sax bin ji bo pêşve birina çanda Kurdî.

"Ewropiyek li welatê kurdan" navnîşana pirtûkekê ye ku ji hêla Hevjîna Dr. Qasimlo, Nesrîn Qasimlo (Helen Klolish) ve hatiye nivîsandin, û roja înê di awahiyê Enîstîtûya kurd li Parîsê de hate nasandin.




www.arsivakurd.org

## "Ewropiyek li welatê kurdan" belav bû

**Pirtûka Nesrîn (Hêlîn) Qasimlo, hevjîna Dr. Qasimlo bi feransewî derket**

Nesrîn Qasimlo Hevjîna Rêberê navdarê kurd Dr. Ebdulrehman Qasimlo ye ku di nav kurdan de bi dayîka kurdan hatiye nas kirin, ku biserhatên jiyana xwe di gel Dr. Qasimlo di pirtûka han de bi zimanê fransewî tomar kiriye û Nivîser û Civaknasa Fransewî "Joliyita Mans" di warê zimanavanî de pêdeçûna wê kiriye û bingeha çapemeniyê ya Kartala çap kiriye.

Di merasîma nasandina pirtûkê de hejmarek kurd û fransewiyên hevalên Dr. Qasimlo beşdar bûn, ku di destpêkê de Rojnamevanê Binav û deng ê Amerîkî Canatan Rindal li ser pirtûka Xûşke Nesrînê, bi taybetî li ser kesayetiya Dr. Qasimlo axivî.

Piştre Nesrîn Xan derbarê pirtûka xwe û jiyan û biserhatiyên xwe li Kurdistanê û di gel kak Dr. Qasimlo axaftinek pêşkêş kir û sipasiya wan kesan kir ku di çapkirina wê pirtûkê de alîkariya wê kirine. Di dawiyê de ji hêla nivîser û ew rojnamevanên ku axivîbûn bersiva pirsên beşdaran hate dayîn.
Avestakurd



## Yekemîn festîvala keltûra netewî a Kurd li Pîranşarê hat lidarxistin

Yekemîn festîvala keltûra netewî a Kurd li gundê "Badînawê" a Pîranê, ser bi devera Pîranşarê, roja Înê, 13'ê Gulanê, bi beşdariya pêtir ji Pênc hezar kes ji xelkê wî bajarî birêve çû.

Hêjayî gotinê ye ku dirûşma festîvala han bi vî awayî hatibû binavkirin: Geşekirina ziman, wêje, çand û keltûra gelê Kurd erkê netewî yê her mirovek Kurd e. Gavavêtin di vî warî de hestkirin bi vê rêbaza netewî ye û berpirsiyaretî ye di asta qedera gelê me de.

# Gavek girîng di derbarê Bedirxaniyan de

## Şandek PDKÎ li Konferansa danasîna "Ensîklopîdiyaya Bedirxaniyan" de beşdarî kir

Roja duşemiyê 16'ê Gulanê li Hewlêra paytext civînek li ser pêkanîna Ansîklopediya Bedirxaniyan pêk hat. Civîn bi hevkariya Saziya Bedirxaniyan û Enstîtuya Frensî hat amade kirin. Gelek rewşenbîr û kesên di derbarê Bedirxaniyan de pispor û mamusteyên Zankoyo, di civînê de amade bibûn. Armanc ew bû ku di derbarê Badirxaniyan de hemû nivîs, belge û zanyariyên heyî li nawendekê de kom bibin û ji vê nawendê Ansîklopediya Bedirxaniyan bête amadekirin. Herweha Gelek siyasetvanên wek, Rostem Cehangîrî, Endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ, Nunerê Serokê Herêmê Kurdistanê Felakeddîn Kakeyî, Sekreterê Giştî yê PSK a Kurdistanê Mesûd Tek, Konsolê Fransayê ya li






Hewlêrê, Fredric Tissot, Serokê Enstituya Kurd li Parîsê Kendal Nezan, gelek rewşenbîr, hunermend û hejmareke xwendevanên zanîngeha Selahedîn jî beşdarê vê konferansa bûn.

Di konferansê de endamê amadekariya Saziya Bedirxanî Dr. Azad Ahmed Şerîf û Berpirsê Saziya Bedirxanî Hebîb Ebûbekîr Bedirxan, nivîskarê kîtêba "Cizre-Botan Beyî Bedirhan, Direniş ve İsyan Yılları" Ahmet Kardak, Mamosteya Zanîngeha Selahedîn Dr. Şukriye Resûl û Seroka Enstituya Frensî ya li Hewlêrê xatûn Emilie, rewşenbîr Mumtaz Heyderî û Sînemxan Bedirxan jî her yek ji wan axaftinek kirin û li ser jiyan, xebat û tekoşîna Bedirxaniyan û herwisa amadekariya Ansîklopediya Bedirxaniyan agahî dan beşdarvanan.

Di konferansê de herweha fîlmeke dokumenterî ku li ser xebat û rojnamegeriya Bedirxaniyan hate nîşandan.

# Evîna xeyalî



**Ceifer Mubeşirniya**

*Tîrên çavên te dijwarin,*
*dilwêranker*
*Biriyên te rumen hilkişyayî,*
*cerigbir*
*Girnijîna te birûske,*
*hinavan dihelîne*
*Tev amade ne...*
*Di destên te zalima bêrehm*
*de*
*Tika dikim,*
*tu deşta sîngê min neke*
*armanc*
*Tu armanca xwe*
*biguherîne,*
*here welatê dilekê ku di*
*evînê de bi ezmûn be*
*Hêj qîz û nobikan,*
*sûsin ji mêrgên zinarê*
*sîngê min de bijarte*
*nekirine*
*Hêj di kolanên bajarê dilê*
*min de,*
*zeriyên rûken,*
*bewşikê evîndariyê ji tewnê*
*xweziyên min nedane,*
*ji xwe re neraçandine*
*Hêj di riya kaniya dilê min*
*de,*
*rûbixalan cerê dildariyê li*
*kevirê kaniyê nedane,*
*bo balkêşiya xortan*
*neşikandine*
*Tika dikim,*
*ji ware sîngê min dûr*
*bikeve*
*Ger armanca te nahê*
*guhertin,*
*tu dê her êrîşa deşta sîngê*
*min bikî*
*piştî xaporkirina bajarê*
*dilê min,*
*kawilên wê bi cih nehêle û*
*neçe*
*Ji xwe re ava bike,*
*bike hêlûn û mesken*
*Bila ez beylikê te bim heya*
*awî*
*Ji bo parastina çavên te,*
*ez cangorî me*
*Ji şehîdbûna di riya çavên te*
*de,*
*ez netirs im*
*Çimko dibêjin,*
*şehîd digîjin armancên xwe*
*ên xeyalî*
*Dema ku ez di xeyal de jî*
*digîjim çavên te,*
*roja parvekirina cîhanêye,*
*ku para zêde ber min dikeve*

www.arsivakurd.org

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com




## Di her demjimêrekê de destdirêjî bo ser 48 jinên Kongoyî tê kirin



**Lêkolînvanên Amerîkayî dibêjin ku di her yek demjimêrî di Komara Demokratîk a Kongoyê de, 48 jin dikevne ber destdirêjiya cînsî.**

Li gorî gotina wan lêkolînvanan di 12 mehên sala 2006 û 2007'an de 400 hezar jin ku temenê wan di navbera 15-49 saliyê bûye ketine ber destdirêjiyê.

Pêştir NY di raporekê de ragehandibû ku 16 hezar jin destdirêjî li wan hatiye kirin, lê ew rapora ku lêkolînvanên Amrîkayî bilav kirine 26 caran zêdetir ji vê hijmarê ye ku NY bas kiriye.

Tund û tûjiya cinsî yek ji sedemên şerê navxweyî li herêmên rojhelata Kongoyê de ye.

## Xelata cesûriya di karê nûçegihaniyê de, sê jinên nûçegihan wergirtin

**Sê jinên nûçegihan ku yek ji wam Îranî ye karîn ku xelata cesûriya di karê nûçegihaniyê de wergirin**




Ew xelat bi wan jinan tê dan ku di rewşên herî aloz de jî karê xwe yê nûçegihaniyê didomînin. Binyata Navnetewî ya nûçegihanên jin ragehand ku jinek ji Mêkzîkê bi navê " Adla Nawaro Bilo" û jinek ji Îranê bi navê "Perîsa Hafizî" û jink ji welatê Taylendê bi navê "Çîr Anûç pir Miçayporn" di rewşên herî aloz û bi tirs de jî, di warê tundûtujî, gendelî, meşên nerazîbûnê ên xelkî, di welatên xwe de karê zanyarîgehandinê û amadekirina raporan encam dane.

Her sê jin di meha Oktoberê de bi awayekî fermî li rê û resmekê li Losancilis û Niyoyorkê de, wê xelatên xwe wergirin.

Kargêrê wê binyatê bi navê "Lîza Giras" got: "Em şanaziyê bi xwe dikin ku bikarin rêz ji wan jinên cesûr bigrin, ew jinên ku ji bo zelalkirina ratsiyên jiyanê di welatê xwe de, bi ceribandinên herî tund û zehmet re berbirû dibin, ew berjengên rolê girîng yê ragehandinan di civakê de ne".

## Ji ber hejarî û belengaziyê; zarokê xwe li hemberî 600 hezar tûmenî de firot!!



**Jinek cahêl li bajarê Turbet Camê, ji ber hejarî û îtiyada xurt bi madeyên hişber, zarokê xwe li hemberî 600, 000 tûmenî de firot.**

Pêka nûçeya rojanameya camê cem li Îranê de, jina ciwan piştî lihevkirina bi malbatek bê zarok re, zarokê xwe li hemberî evqas pare de radestî wan dike. Gorî gotinên wê jinê, piştî borîna midehek bi ser jiyana hevpar a wan de ji hêla mêrê xwe ve tûşî îtiyada bi madeyên hişber dibe û ji bo bijîva jiyana xwe neçar dimîne ku dizî û xazokatiyê bike. Paşan ew pêgiran dibe û mêrê wê jî dev jê berdide û direve. Jina han paşan ji ber destkurtî û bêşiyaniya li hember peydakirina bijîva xwe, zarok û herweha mesrefa nexweşxaneyê, neçar dimîne ku dest bi wî karê kirêt ê firotina zarokê xwe bike.

Hêjayî gotinê ye ku pêka serhejmariyan niha asta hêla hejariyê gelek jorde çûye û madeyên hişber jî wekî belayek malwêranker berbûye canê civaka Îranê û giranî jî her ku diçe jorde diçe û bûye sebebê serhildana gelek diyardeyên kirêt ên civakî.

## Rejîma Îranê di Vênzoilayê de binkeya muşekî heye

**Hogo Çawiz û Ehmedînijad bi awayekî nihênî di meha Novemberê de rêketinnameyek wajo kirine**



Li gorî nûçeya rojnameya "Dêy wolt"ya Almanî, Îran û Vênzoilayê bi hevre binkeyek muşekî di nav xaka Vênzoilayaê de ava kirine.

Wê rojnameyê herweha ji zimanê çavkaniyên emniyetî ve nivîsandiye ku niha cihê binkeya muşekî ya nepenî di herêma "Pinin zula Paraguê" li 120 kîlometriya sînorê Kolombiya de ye.

Amadekirina xerîteyên rawestingeha fermandehiyê û kontrola binkeya muşekî, bircên nobedariyê û herweha ew çeperên ku biryar e kolahek û şevata muşekan û tiştên din têde bihê veşartin, beşek din ji meimûriyeta Sipahê ye. Herweha biryar e ku muhendisên Vênzoilayî enbarên xwe di kurahiya 20 metrî de ava bikin.

## Çav li hemberî çav!! hukmê qesasê li Îrana Îslamî de

**Çav li hember çav de hukmek qesasê li Îranê de bû ku birêve neçû û hat paşdexistin.**



Qirar bû li 14'ê Gulanê de hukmê qesasê li ser xortekê (Mecîd Muwehidî) birêve biçe ku 8 salan berî niha piştî evînek bêencam tîzab pirijandibû ser ser û çavê evîna xwe (Amine Behramî) û ew kor û ji dîtina yekcarî bêpar hişt. Hêj sedemên paşdexistina birêveneçûna hukmê qesasê nediyar in, û goriya wê cinayetê jî hêrs û xembar.

Mecîd Muwehidî, ew xortê ku 8 salan berî niha piştî evîna yekalî û xwazgînîkirina çend carî ji Aminê bi bersiva ret re ber bi rû bû û li encam de dest bi wê kiryara hovane da û asêd pirijande ser û çavê wê û got madam ku bo min nebe bila bo kesê din jî nebe! Tu li vê qebahetê!!

## Behrêyn jî amadekariya şandina gemiyên alîkariyê bo Erebên Ehwazê dike



**Li hemberî desttêwerdan û azirandinên Komara Îslamî li kar û barên Behrêynê de, nûnerên Parlementoya Behrêynê daxwaza şandina gemiyên alîkariyê bi herêma ''Ehwazê''kirin**

Xanim Ebuleynîn, serokê komeleya siyasî- mesebî a''Esalet'' û endamê perlementoya Behrêynê li got û bêjek bi Elerabiyê re da zanîn ku wî û hejmarek ji hevbîrên xwe biryar dane ku aliyê kêm du gemiyên alîkariyê bişînin''herêma Ehwazê''.

Wî daye zanîn ku yek ji wan gemiyan nexweşxaneyek gerok û pêkhatî ji îmkanatên dermanî û kadroyên pizîşkî dibe û hevkariyên mirovdostane ên xelkê Behrêynê dê bigihîjîne hevzimanên xwe yên Ereb li Îranê de.

Navhatî eşkere kiriye ku erebên Ehwazê ji ferq û cudahiyên regezî û netewî ji aliyê desthilatdarên Îranî ve, êş û azaran dikişînin. Bi taybetî li meş û serhildana îsal de zêdeyî 100 kes bûne gorî.

Ew pêngava komeleya''Esalet'' piştî wê hat ku rejîma Komara Îslamî jî du gemiyên alîkariyê ber bi Behrêynê xistibûn rê ku dîsan paşde hatin vegerandin.